**Ger li Parîsê jiyabam**

**Kejal Nûrî**

**Minê li her kolanekî, nemamek bişewitanda**

**Li her taxekî, camê erebeyekî bişikanda**

**Bi siboxa hemelşina sor,**

**Li ser camxaneya hemû marketan binivîsanda û**

**Firçeya Salvadur Dallî bianiya û**

**Mal bi malên wî bajerî sor bikira,**

**Û dar û berên Şanzêlîzê (Champs-Élysées)**

**Weke kevirekî xwîniyê li ser lotika Qendîlê,**

**Piştî şehadeta her gerîlayekî, bixemilanda.**

**Min li berdem derê her malekî, alayeke Kurdistanê diçeqand,**

**Ger li Parîsê jiyabam**

**Bi siboxa reş,**

**Li ser rawestegeha hemû otubusan binivîsanda:**

**Hûn bûn yên peymana Saykis Pîko îmze kir**

**Û li Lozanê, dîroka kurdan gehande roja îro.**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Niha weke Eliya Macîd,**

**Çend jinên por zer û çav şîn têde hene**

**Tazî bikira û alayeke Kurdistanê li wan werpêçaba,**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Çiqas gilopên dartêlên bajêr hene**

**Bi berê darlastîkê bişikanda û**

**Li şûna wan, kite pêlava gerilayekî şehîd, heldiwasî…**

**Û ji bo bangevaziya mafê mirovan, bikira sembola afirandinê!**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Minê kewalîsa li ser dika şanoyan têk bida û**

**Posterên hemû pêşangehên hunerî biçiranda**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Minê ji dûr ve hemû beşdarên konseran bida ber keviran û**

**Ji wan re bigota:**

**Min dawiya Mozart, Bax û Şopenhawêrê we ragihand.**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Minê li zengila deriyê hemû malan bixista**

**Û bigota: lazime hûn hemû deqeyekî bêdeng bin,**

**Îro, Qasimlo li bilindtirîn dêra bajêr e,**

**Zengila sersaxiyê lêdide û**

**Ji ber terora sê jinên Kurd,**

**Dîroka we dixe jêr pirsiyaran,**

**Bajarê we diherikîne…**

**Ger li Parîsê jiyabam**

**Min şa (Kilufîsê yekem) ji gorê derixista**

**Jêre bigota: lazime ji bo ezemeta şerefa şahnişîna ferengê,**

**Bi şahzade Luyîs re**

**Li pêşî bimeşin û darbesta (Cansizê) helgirin ser milan**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Min (Alp) ji cîhê xwe ladida**

**Vediguheste nav jora Apo, li girava Îmraliyê û**

**Bikira qelayek bo bakurê Kurdistanê**

**Bi zilleyekî (Îfêl) bixiste ser layekî û**

**Agirê Newroza îsal bibira ser (Elmun Bilan)**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Min îro programên ekrana hemû TV yan Hack bikira û**

**Peyamek bo kurdan bixista ser erkranê:**

**(Werin em hemû, sibê li ser gora Şarilman, dest bi xwepêşandanê bikin)**

**Ger li parîsê jiyabam,**

**Min bi yek rojê topogirafiya 'Galê' helweşanda**

**Di nava hefteyekî de, dêmografiya şahnişîna ferengê bişêwanda**

**Ger li Parîsê jiyabam,**

**Minê çil rojên sersaxiyê bibira mala Oland û**

**Jêr bigota:**

**Ji ber çi ew bajarê te,**

**Ku ji bo Ocalan xîweteke aram têde nebû,**

**Niha pirre li gulle û terorîstan û**

**Siloganên terora gelekî bê navnîşan û bê nasname?**

**Axxx ger li Parîsê jiyabam!!!**

**Kejal Nûrî**

**Ji Soranî: Dêrsim Oremar**